BABA SERHENGÊ DEWDUWANÎ

**Serheng Dewdan Serheng Dewdan**
**Ez im ku navê min Serhengê Dewdan**
**Gel çend murîdan digerim erdan**
**Dikoşim ji bo ayinê Kurdan**.

**Jînîgarî**:
Baba Serheng kurê Îbrhîmê Dewduwanî yê herêma Dewduwanê(Dewdan)ê ye li gundê Bayniganê ya nêzî bajarê Bawe ya devera Şaho, Makwan û Seryasê ya Hewramana Lihonê li xwar bajarê Sineyê anku çemê Sîrwan û Şêxanê li kêleka çiyayê Zagrsoê di sala 935-936 a zayinî anku sedeya care koçî de jidayik bûye. Dêrşîîra wî ya ku dibêje:
“We seney sê sed û bîst û çiwar hîcrî
Hatîf namî ew ce şaho çirî”
Sala jidayikbûna wî diyar dike diyar dike.
Baba Serhengê Dewdan xwedanas, fîlosof, arîf, şaîîr, tenbûrjen û yek ji rêberê ola Kurdî ya Yarsanî û sofîgeriyê bûye. Baba Serheng yan Bawe Serheng di hin nivîsan de weku “Bawe Serhengê Xezeyî” jî tê gotin, goye tevî xezeyê jî bûye û şerê bêbaweran kiriye. Di dema bilind bûna merteba wî, ew û gelek ji murîdên wî digerin û bangewaziya dînî yarxwedayî ya Yarsaniyê dikin. Baba Serheng piştî Baba Şaxoşîn tê ku mezintirîn rêberê baweriya Yarxwedayî ya Yarsanî bûye ji Loristanê ta Hewramanê. Dûre wê rêberîtiyê ji Baba Serhengî tê dayin û ew karekî mezin a Yarxwedayî dike ligel murîd û rêşanên wî yên weku “Bawe Sirincê Kelatî, Bawe Gerçikê Hewramî, Bawe Qeyserê Hewramî, Dayê Tewrêza Hewramî, Baba Îbrahîm, Baba Ahmed, Baba Retaf, Baba Rom, Baba Newaw, Baba Renc, Baba Xûnkar, Sebûre û çendên din digerin û bangxwaziyê dikin. Lê wê demê ji aliyê şerîetnas û feqîhên îslamî tên dijatî kirin û fetwa li ser wan tê dayin bi taybetî ji aliyê kesekî diyar bi

navê “Sebûre” ku dû re heman kes tê ser bîr û baweriya Baba Serheng û dibe murîdê wî. Dijatiya Baba Serheng û rêhevalên wî bi sedema ku wê rêbazê tevlî “Batin”ê dibe û Yarxwedayî dibêje: ê ku meqama rêbaz û şerîetê derbas kir û gihişt heqîqetê anku “Fena fî alleh”ê, êdî pêwîst nake şerîetê îbadet bike. Li ser heman baweriyê, gelek ji xelk dest ji îbadetê berdan û ketin kûrahiya rêbazê û jiyaneke rehbenî anku terkejînî jiyan ku wê rewşê bû sedemeke mezin da li hember wê rêbazê bisekinin û gelek bûyerên nexweş jî rûdan di wê demê de.

**Baba Serheng di warê mûzîkê de**:
Baba Serheng yek ji tenbûrjenê zanyar bûye di dewrana xwe de, ew şîîr û mûzîk anku peyv û tenbûrê dihûnand û hestên xwe û bîrûbaweriyên Kurdî ji xelkî re dianî zimên û derbêj dikir bi murîdên xwe re der bi der û herêm bi herêm.

**Baba Serheng di warê şîîr û edebiyatê de**:

Baba Serheng yek ji şaîrên herî bilind û mezdayê Kurd e. Şîîrên wî bi gover û zaraveya Hewramî bûne û li ser şêwaza du beytî ne û her çar nîv dêrşîîrên li ser yek serwa û qafiyê ne. Hin ji wan du beytên Baba Serheng û yawerên wî di deftera “Dewra Baba Serheng”ê de hatiye parastin û arşîv kirin.
Çend mînak ji şîîrên Baba Serheng Dewdanî:

Serheg dewdan, Serheng dewdan
Ez ke nammen Serheng dewdan
Çenê êrmanan megêllim herdan
Mekoşim perê ayinî Kurdan.

Di vê şîîrê de giringî û rola dînê Yarsanî dide rû ku yek ji dînê kevn a Kurdî ye û berî îslamê dînê xelkê Kurd û Kurdsitanê bûye ku, her sê dînên “Yarsanî, Zerdeştî, Êzîdî” weku sê dînên Kurdistanê ku koka wan her sêyan jî dîn û baweriya Mîtrayî ne. Baba Serheng di wê du beytê de dibêje:

Serheng Dewdan Serheng Dewdan
Ez im ku navê min Serhengê Dewdan
Gel çend murîdan digerim erdan
Dikoşim ji bo ayinê Kurdan.

Dûre dibêje:

Cem pey rasanen cem pey rasanen
Yaran yaweran cem pey rasanen
Her kes nêweke kero asanen
Cem pey roşinî zêll û xasanen.

Di cihekî dî de dibêje:

Pey amantan, pey amantan
Gird amadeban, pey amantan
Ez melhem menyew nezamantan
Meresm we heq îmamantan.

Di vê şîîrê de wê rastiyê xuya dibe ku gelek bîr, nêrîn û têbînî di nava dînê îslamê de di wê demê de di nava xelîfeyên Abbasî ku peyrewa şerîetê dikin û yên din de serîhildan, yeke dî jî zihniyeta îmhakirin û nehiştina dînên din bûn bi taybet dînên Kurdî. Di vir de em dikarin têbîniya wê bikin ku Baba Serheng di wê demê de wê şîîrê nivîsandiye ku çevsandina dewleta Abbasî û xelkên Kurdistanê bi taybet herêmên Şehrezûr û Hewramanê tund bûye û her weha rola dînê Yarsanî di wê demê de xuya dide ku pirr bi hêz û berbelav bûye ku yek ji dînên Kurdî yên kevnar e di Kurdistanê de li kêleka dînên Zerdeştî û Êzîdî de.

Di cihekî dî de dibêje:

Hayagem çollen, hayagem çollen
We wêney ferhad, hayagem çollen
Lal im neballen, post im nekollen
Hemdem kohen yaran nehollen

Di vê du beyta şîîrê de jî şaîr bi awayekî sofîgerî, vêl û derbider li deşt û herdan digere li pey rastî û heqîqetê.

Li cihekî dî dibêje:

Heft im ser xêllen, heft im ser xêllen
Ce asiman da, heft im ser xêllen
Her yek we rengê, negeyişt û gêllen
Her yek pey karê aware û wêllen.

Di vê şîîrê de mebesta şaîr "heft laş" anku "heft ferîşte" ye ku ew heft laş yan ew heft ferîşte berî ademîzad û mirov hebûe. Helbet di Avestayê de behsa şeş ferîşte tê kirin ku her şeş laş û ferîşte dibin laş û ferîşteyê heftemîn ku di Ahûra Mezdayê de şênber dibe.

**Wefata Baba Serhengê Dewdanî**:

Baba Serheng di 1007ê zayinî wefat dike û li gorristana Tewêlleyê li gundê Tewêlleyê tê naştin ku mezintirîn gorristana wê deverê ye û gorrên gelek kesatî, zana û rêberên dînî yên Kurdî li wê derê ne. Gundê Tewêlle niha dikeve paja Hewramana Başûrê Kurdistanê. Helbet li gund yan jî bajeroka Dewdan yan jî Dudanê li baxê "Dawde Sûr"ê bi kevinên kelekî weku sembolî gorra wî tê çêkirin.

*Têbînî: Baba Serheng ji bo min zor taybet e, em dikarin şîrra wî ya du beytî ku dibêje:*

*Serheg dewdan, Serheng dewdan*
*Serheng Dewdan Serheng Dewdan*

*Ez ke nammen Serheng dewdan*
*Ez im ku navê min Serhengê Dewdan*

*Çenê êrmanan megêllim herdan*

*Gel çend murîdan digerim erdan*

*Mekoşim perê ayinî Kurdan*

*Dikoşim ji bo ayinê Kurdan*

*Wê şîîrê weku yekemîn yan jî yek ji yekemîn şîîrê netewî tê nasîn, Tu dîmena rewşa wê demê û xem û êşa Baba Serhengê Dewdanî bîne ber çavên xwe ku bi tenbûrê xwe û bi hest û helbestên xwe der bi der û herêm bi herêm geryaye, di xema dîn û bîrûbaweriya Kurdî de bûye û xwastiye xelkî hişyar bike dîrok, dîn, çand û baweriyên dapîr û bapîrên xwe ji bîr nekin ku wê demê dînê nû bi taybetî di dema Abassiyan de bi hêz û tirsê belav dibû li herêmê û Kurdistan bi giştî, lê pîremêrek bi xwe û rêhevalên xwe re, bi tenbûr û zimanê şîîr û mûzîkê ji xelkê xwe re banga xwenasî û hişyariya neteweyî û nirxên Kurdî dike ku dest jê ber nedin.*
*Ew rewşa Baba Serhengê mezin zêdetir ji 1000 sal ber, heman rewşa niha ya bakurê tîne bîr û berçavê min ku civakek ji ber hin sedeman, hêdî hêdî dest ji ziman, çand, niştiman, netewe û hemû nirxên xwe berdide û pey erzaniyên dagirkerên xwe dikeve ku destpêka wê ji zimanê dijminî destpê dike, bi dehan hezar rêşanên mîna Baba Serheng canê xwe dan, ketin zîndanan, derbider bûn tenê bo ku gelê Kurd li bakurê hişyar bikin da ku pey erzaniyên dijmin û zimanê dagirkerên xwe nkevin û nirxên xwe yên hezaran salî biparêzin, lê mixabin wisa xuya dike ku hezkirina alavên dagirker û dijmin di heman hestên sandruma stokholmê de ye.*

Lêkolîn û Nivîsandin: Qendîl Şeyxbizînî
Hewlêr – başrê Kurdsitan